Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1318 22-Cotmeh-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Bi ta û derziyê hêviyên veger û berxwedanê dihûne

**Dîlan Mulhim\Hesekê**

**Di nava zor û zehmetiyan de, li Kampa Serêkaniyê gelek çîrokên balkêş tên jiyankirin. Bi taybet jin rastî gelek astengî û zehmetiyan di hundirê kampê de tê, yek ji wan jinan Necwa Xalid e ku bi rêya karê dirûtina cil û bergan debara jiyana malbata xwe dike.**

Di sala 2019'an de, dewleta Tirk a dagirker êrişî bajarê Serêkaniyê û Girê Spî kir, di encama êrişan de her du bajar hatin dagirkirin. Herwiha gelên wan bajaran ji ber êrişên hovene yên çeteyan koçberî herêmên bi ewle yên Rêveberiya Xweser bûn. Rêveberiya Xweser ji bo bicihkirina van koçberan kampa Waşokanî û Serêkaniyê avakirin.

### Koçber hemû astengî û zehemtiyan bi têkoşîneke mezin derbas dikin

Koçberên Serêkaniyê û Girê Spî hemû astengî û zehemtiyan bi têkoşîneke mezin derbas dikin û bi hêviya vegera cih û warên xwe jiyan dikin. Koçber êş, zor û zehmetiyên ku îro li kampê dikşînin hevkarên dagirkeriyê berpirsyar in. Koçberên li kampê ruxmî ku kamp ji xwe re kirine cih û war, lê belê hêviya wan ya vegera bajarê wan mezin e.

### Li kampa Serêkaniyê gelek çîrokên balkêş tên jiyankirin

Di nava, zor û zehmetiyan de, li kampa Serêkaniyê gelek çîrokên balkêş tên jiyankirin. Bi taybet jin rastî gelek astengî û zehmetiyan di hundirê kampê de tên. Li gorî vê jî jin dikare jiyaneke xort bide afrandin, yek ji wan jinan jî Necwa Xelîl e. Herwiha Necwa Xelîl yek ji koçbera kampa Serêkaniyê ye û bi xwe ji bajarê Serêkaniyê ye, Necwa bi rêya karê dirûtina cil û bergan debara jiyana malbata xwe dike. Necwa 42 salî ye û ji 6 saliya xwe ve dema ku li Serêkaniyê bû dest bi karê dirûtina cil û bergan kiriye. Lewra karê dirûtina cil û bergan jêhatbûna wê bû. Herwiha Necwa dayîka du zarokan e.

Karê dirûtinê yek ji kevintirîn pêşeyên ku mirovan afirandiye û bi demê re pêş ketiye. Di demên berê de dirûtin bi derziya destan dihat kirin, piştî wê makîneyên bi dest û lingan hate derketin, lê her ku çû bi pêşketina teknîkê re dirûtin pêş ket. Di dema niha de karê dirûtinê bi giştî bûye bi rêya makîneyên dirûtinê yên nûjen. Yek ji jinên ku karî tevî êşa koçberiya li ser lingên xwe bisekine û debara jiyana xwe bike Necwa Xalid e ku li kampa Serêkaniyê bi cih dibe.

### Tayên hêviyê di konekî biçûk de

Neciwa Xalid di sala 2019'an di encama dagirkirina dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê de mala xwe li Serêkaniyê winda kir. Wê dest bi dirûtina cilên sade ji bo cîranên xwe û zarokên kampê bi xercek hindik kir, da ku debara xwe ya rojane peyda bike.

Karê dirûtina cil û bergan jêhatbûna Necwa Xalid bû dema ku ew biçûk bû hezkirineke wê a mezin ji karê dirûtina cil û bergan re hebû. Li ser vî bingehî wê di 6 saliya xwe de dest bi karê dirûtina cil û bergan kir.

Necwa Xalid li ser karê xwe yê dirûtina cilan di nava kampê de wiha dibêje: "Dema ku ez li bajarê Serêkaniyê bûm, min di malê de karê dirûtina cil û bergan dikir. Lê dema ku em koçberî kampa Serêkaniyê bûn, min dîsa karê dirûtina cil û bergan berdewam kir, ji bo debara jiyana xwe."

Di her dirûna ku ew didirû de, çîrokeke êş û hêviyê heye, êşa koçberiyê û hêviya vegerê. Konê wê yê biçûk bûye atolyeya wê, cihek ku jinên kampê lê dicivin da ku di nav zehmetiyên jiyanê de sohbet bikin û bikenin.

### Necwa Xalid îsbat dike ku îrade ji şer xurttire

Di destpêkê de dema ku ew derbasî kampê bûn elektirîk li kampê tune bû, ev yek dibû astengî li pêşiya karê wê, lê rewşa niha hate guhertin, ji ber ku elektirîk li kampê peyda dibe. Di aliyê nirxê dirûtina cil û bergan de ew dibêje: "Ez bi kesên ku derfetên wan kêm bin, ji aliyê pereyan ve dibim alîkar." Jina koçber a ji bajarê Serêkaniyê Necwa Xalid hêvî dike ku ew rojek ji rojan vegere cih û warê xwe û karê xwe yê dirûtina cilan bi hêsanî li wir berdewam bike. Tevî westandina xwe, Necwa Xalid xeyal dike ku rojekê li bajarê xwe




xwediyê dikaneke terziyê ya biçûk be. Dema ku ew li qiraxên zingar ên makîneya xwe ya dirûnê dinêre, ew dibêje: "Heta ku derzî û ta li cem min hebin, jiyan hîn jî mimkun e."

Bi vî awayî Necwa Xalid dirûtina qumaşan û her wiha dirûtina hêviyan jî dewam dike, konê xwe yê sade û bêdeng vediguherîne cihekî berxwedanê ku li dijî bêhêvîtiyê û îspat dike ku îrade ji şer xurttir e.



**Bi kamîreya Ayşa Silêman**



Rihanîk

## FERHENGA BIWÊJAN

**Destê wî dar girtiye:**
- Êdî dikare xwe xwedî bike; gihatiye.

**Êdî destê wî şivê digire:**
- Mezin bûye, êdî dikare ji malê re karekî bike.

**Êdî diçe ber golikan:**
- Bi heman wateyê.

**Ma heta stirhên kerê neyên her dehşik e?**
- Êdî ne weke berê ye, bi kêrî tiştan tê; mezin bûye; bi çavê piçûkan lê nenêre.

**Nû tayên simbêlan şîn hatine:**
- Nû bûye xort.

**Tu dibêjî qey marê beqxwarî ye:**
- Zikê wî pir mezin bûye.

**Xwêya malê jê tê xwestin:**
- Êdî mezin bûye.

**LI SER TIŞTÊN TÊKILIYA WAN BI HEV RE NEYÎ**

**Cilê cendirme teng in, deşta Sêrtê heriye, siwara reprep e:**
- Dema yek diaxive lê gotinên wî ne bi ser hev ve bin, ji hev negirin hingê jê re tê gotin.

**Ker li kû dikeve, kunde li kû didire:**
- Dema du tişt hev negirin, têkiliya wan bi hev re tinebe, hingê tê gotin.
(Kunde: Kunê avê. Berê postê nêriyan, yê çêlekan ji bo avê bi kar dianiyan)

**Ker li kû ketiye, kurtan li kû derê diriyaye:**
- Tiştek li cihekî bûye tu behsa tiştekî din dikî; têkiliya her du bûyeran bi hev re nîne.

**LI SER BÊBANDORKIRINÊ**

**Cinên wî girtin:**
- Bêbandor kirin; êdî nikare tiştekî bike.

**Perên wî qusandin:**
- Bêbandor kir; tirsand.
(Carna dema yek zirtan jî li yekî dike, dibêje; ezê perên te biqusînim)

**Quloçên wî şkandin:**
- Ji hêzê xist; quretiya wî jê bir.

**Teriya wî di ber de jê kir:**
- Bêbandor kir.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Dorpêçkirina Şêxmeqsûd û Eşrefiyê wê kirîzên aborî û mirovî bi xwe re bîne'



Cîgira Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Dunya Bekir diyar kir ku gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê heya roja îro di nava dorpêçeke giran de ne û got, "Ji aliyê çekdarên hikumeta veguhêz ve gel rastî gelek kiryarên çewt tên û bi awayekî rehet nikarin tevbigerin, ev yek jî wê bibe sedema kirîzên aborî û mirovî."**R-6**

## 'Name gihan saziyên navdewletî, lê bêbersiv mane'



Rêveberiya Însyatîfa Sûrî ya ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir da zanîn ku pêngava nameyan û radestkirina nameyên Rêber Apo ji bo eşîreyên Ereban encamên gelek baş anîn, herwiha nameyên ji bo azadiya Rêber Apo yên ku ji rêxistinên navdewletî re hatin şandin, hîna bêbersiv in.**R-5**

## Girtîgehên Îranê; Dojeha jin û zarokan



Ji siyaseta girtin û darvekirinê ber bi binpêkirinên ku dibin sedema mirina girtiyên jin di zindanan de. Îran; jîngeha herî xeternak a ku dibe sedema kuştin û jidestdayîna jiyana mirovan e.**R-2**

## Girîngtirîn şoreşên cîhanê



Serdemên desthilatên zordar û serdest yên ku mafê gelan çewisandine, gelek in. Li hember wan serdeman gelek serîrakirin, serhildan û şoreş rabûn. Ev şoreş herî zêde ji aliyê faktora cotkar û bindestan ve pêk hatine, da ku hemû çînên dewletê kêmek be jî; bi wekhevî û edaletê jiyan bikin.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1318 22-Cotmeh-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# PÊŞANGEHA ŞEHÎD HEREKOL JI HERÊMÎ BER BI NAVNETEWEYÎ VE

Bi dirûşmeya "Pirtûk Kilîda Şaristaniyê ye" û beşdariya 51 weşanxaneyan, 9'mîn Pêşangeha Şehîd Herekol a Navneteweyî ya Pirtûkan di 21'ê Cotmehê li Qamişlo hat destpêkirin. Endamên Komîteya Amadekar û nivîskarên ku beşdarî pêşangehê bûne diyar kirin ku Pêşangeha şehîd Herekol bûye sembola zanînê li tevahî herêmê.**R-7**










## Guhertina siyaseta Rûsyayê li Sûriyê... Veguhertina ji bo berjewendiyan



Bi dirêjahiya kirîza Sûriyê re Rûsya weke hêzeke sereke û bibandor bû di kûrkirina kirîzê de, herwiha ew piştgira rêjîma Baas bû hetanî ku têkçû. Ji destpêka aloziya Sûriyê heta roja îro, Rûsya dikarîbû siyaseta xwe di hundir û derveyî Sûriyê de li gorî berjewendiyên xwe, biguherîne.**R-4**



**Azadî pêşî di fikir de dest pê dike**
Nehîr pale R-2



**Banga Bahçelî ya 22'yê Cotmehê**
Farûk Sakik R-5



**Li Sûriyê ji bo demokrasiyê dê rê vebe?**
Zekî Bedran R-5



**Rojava ji bo cîhanê mînak e!**
Rohat Bulut R-6

# Girtîgehên Îranê; Dojeha jin û zarokan

Ji siyaseta girtin û darvekirinê ber bi binpêkirinên ku dibin sedema mirina girtiyên jin di zindanan de. Îran; jîngeha herî xeternak a ku dibe sedema kuştin û jidestdayîna jiyana mirovan e.



**Esma Mistefa/Qamişlo**

Sîstema girtîgehên Îranê ji sîstema hişmendî û pergala dewletê ne dure. Di girtîgehên Îranê de kesên ku ji ber dadweriya darvekirinê jiyana xwe ji dest nadin ji ber sedemên cur be cud jiyana xwe ji dest didin. Bi taybet li ser jin sîstemeke xirabtir a ku dişibe xetertirîn girtîgehên cîhanê tê meşandin. Tu zagonên parastina mafê girtiyan li ser wan nayên sepandin. Jin bi sedemên cuda tên girtin, him ji ber sîstema milî a ku jinê dipeçine û nefes jê re nehêştiye, hem jî ji ber redkirina zilam ango derbaskirina zagonên dewletê. Her wiha bi tewanên cuda jin tên girtin. Ji wan gelek kesayetên siyasetmedar, rojnamevan, rewşenbîr û hwd hene. Li ser wan jî tu rêgezên dadweriyê a ku ji mafê wane nayên pêk anîn.

Di meha Îlonê tenê de 4 jinan ji ber şert û mercên girtîgehê yên xirab jiyana xwe ji dest dan. Bi mirina van jinan re careke din balê dikişîne ser siyaseta sîstematîk a rejîmê ya redkirina dermankirina bijîşkî ji girtiyên siyasî re; şêwazek ku dibe sedema girtî tenê piştî ku digihîjin rewşa wan kirîtîk û giran de herin nexweşxaneyê û di gelek rewşan de dibe sedema mirina wan.

Di nav kêmtirî du hefteyan de çar girtiyên jin ji ber nexweşyê, nebaldariya bijîşkan û rewşa zîndanê ya xirab di zîndanên Îranê de jiyana xwe ji dest didin. Ji wan ev çar jinên ku me di rapora xwe de bal kişandiye ser in.

**Meryem Şehrakî**

Meryem Şehrakî di 12'ê Îlonê de li Girtîgeha Qerçekê piştî êşên giran ên singê û teşhîseke xelet ji aliyê bijîşkên girtîgehê ve mir. Her wiha berî ku bibirin nexweşxaneyê mir.

**Sudabah Asadî**

Roja Sêşemê, 16'ê Îlona 2025'an, Sudabeh Asadî ku li Girtîgeha Qerçekê ya li Varaminê ji ber sûcên darayî hatibû girtin, ji ber îhmalkirin û nebûna xizmetên bijîşkî mir. Sudabeh Asadî, piştî ku bi rojan di êş û nexweşiyê de êş kişand, bêyî ku ji bo navendên dermankirinê yên li derveyî girtîgehê were veguhastin, mir.

Heta niha, rayedarên dadwerî û berpirsên girtîgehê ti ravekirinek li ser sedema mirina Sudabeh Asadî nedane. Mirina wê rasterast bi nebûna lênêrîna bijîşkî û derengketina bi zanebûn a veguhestina wê bo nexweşxaneyê ve girêdayî ye.

**Cemîle Ezîzî**

Di roja Înê 19'ê Îlonê de Cemîla Ezîzî, girtiya li girtîgehên Qerçekê ji ber îhmalkariya bijîşkî û nebûna dermankirinê mir.

Girtî ji ber krîza dil birin klînîka girtîgehê, lê bijîşkan bêyî ku dermankirinek cidî lê bikin ew vegerandin beşê. Çend demjimêr şûnda, ew li Beşa Şêwirmendiyê ya 2'an jiyana xwe ji dest da.

**Samiya Raşîdî**

Samiya Reşîdî ya 42 salî li Mehrabadî ji dayik bû, jinek karker li kargeheke dirûnê bû, bi salan ji nexweşiya day (nexweşiyek di serî de ye) dikişand. Li gorî îfadeyên hevalên wê yên hucreyê, ew gelek caran ji krîzên nexweşiya xwe û êşên serî ya giran dikişand ku her tim serî li hemşîreya girtîgehê dida. Lê bijîşkên girtîgehê pirsgirêkên wê wekî "lîstikvanî" hesibandin û ew vegerandin hucreyê, an jî dermanên demarî yên ku têkiliya wî bi nexweşiya wê ve nîne dan wê.

Her çend kefalet ji bo serbestberdana wê hatibû dayîn jî, malbata wê nekarîn hejmara pereyan ya pêwîst peyda bikin.

**Zîndana Qerçek**

Di salên dawî de, Zindana Qerçekê li Tahranê bi qerebalixiyeke giran û kêmasiyên xizmetguzariyên bingehîn, her wiha nebûna xizmetên bijîşkî, bûye sembola binpêkirinên eşkere yên mafên girtiyên jin. Tenê di nav 10 rojan de du girtiyên din, Samiya Raşîdî û Cemîla Ezîzî, ji ber nedana dermankirina bijîşkî li heman girtîgehê mirin.

Niha, hejmarek ji girtiyên siyasî yên jin, di nav de Pervîn Mîrasan, Meryem Ekberî Monfered, Merziye Farsî, û Şîva Îsmaîlî, di Girtîgeha Qerçekê de ji nexweşiyên cûrbecûr dikişînin, û xetera qedexekirina dermankirina bijîşkî hîn jî jiyana wan dixe xeteriyê.

**Qerçek (Dujeha jin û zarokan)**

Rêxistina Mafên Mirovan a Îranê raporek weşand û tê de girtîgehên Qerçax a li Îranê wekî "dojeha jin û zarokan" bi nav kir û daxwaza girtina demildest kir.

Raport roja Sêşemê 10'ê Kanûna 2024'an de bi Roja Navneteweyî ya Mafên Mirovan re hat weşandin, wekî "raporek şoqê" hat binavkirin. Ev rapor binpêkirinên ku di vê girtîgehê de çêdibin ronî dike, wekî "yek ji sembolên herî xirab ên binpêkirinên sîstematîk ên mafên mirovan li Îranê" tê binavkirin.

Di raporê de hat destnîşankirin ku avahiya ku niha wekî girtîgehek jinan tê bikar anîn, di destpêkê de wekî ambarek mirîşkan (Cihê mirîşk lê tên xwedîkirin) hatibû sêwirandin, ji ber vê yekê ew bûye "cihek nemirovane ji bo girtina jinan".

Tê zanîn ku girtiyên jin di "cihên pir teng de, bê hewakirin an ronahîkirinek têrker" de têne girtin, bi ava vexwarinê ya qirêj, xwarina bi kalîteya nebaş, xizmetên tenduristî û bijîşkî yên nebaş, di gel muameleya cudakar û rezî ku hemî beşek ji êşa wan a rojane pêk tînin.

Girtiyekî ragihand ku "di girtîgehê de kêzikên zirardar, di nav de kêzikên jehrîn jî heye", di heman demê de di girtîgehê de mişk, marmêj, kêvroşkên avî û heta dûpişkên jehrîn jî hene.

Her wiha di raporê de hate destnîşankirin ku dayikên girtî neçar in ku zarokên xwe heta du saliya xwe di jîngehên qirêj û xeternak de mezin bikin, berî ku zarok ji dayikên xwe werin veqetandin û ji navendên lênêrîna civakî re werin şandin.

Hêjayî gotinê ye ku dayik pir caran nikarin çarenûsa zarokên xwe bişopînin ango nikarin bişopînin. Her wiha zarokên ku li girtîgehê tên zayin ji nasnameya qanûnî bê par dimînin.

**Binpêkirina "Rêgezên Mandêla"**

Di vê çarçoveyê de, raporên ku ji hêla HRANA ve, ajansa nûçeyan a çalakvanên mafên mirovan li Îranê hatine weşandin, bal kişandin ser binpêkirinên eşkere yên "Rêgezên Mandela" di girtîgehên Îranê de, û îdia kirin ku girtî di şert û mercên nemirovane de dijîn û bi "îstismara desthilatdariyê" ya sîstematîk re rû bi rû dimînin. Rêgezên Mandela pabendbûnekê ferz dike ku li hemû girtiyên rêz li rûmet û nirxa wan a xwezayî wekî mirovan bê girtin her wiha îşkence û awayên din ên muameleya xerab, qedexe dike.

## Ji Pênûsa Jin

### Azadî pêşî di fikir de dest pê dike

Nehîr Pale

Civaka zayendperest gelo destûr dide jinê ku fêr bibe girîngiyê bide fikrandina azad? Ji civakê bi hejmareke gelekî kêm û li dibistanê jî weke dirûşme dihat bikar anîn. Wateya wê û ji bo jinê çi nirxê xwe heye nedihat gotin. Bi milyonan jin dibe ku hîna azadî weke gotin jî nebihîstine. Jin di saziya malbatê de mezin dibe, li saziyên dewletê dixwîne û dawiyê dizewicê. Hejmarek ji jinan nezewicîne lê ew jî ji xwe şerm dikin û gunehê xwe bi xwe tîn in. Jinên ku ne zewicîne ji wan re dibêjin di malê de mane. Dibe ku gelek sedemên ne zewcandina wan hebin lê belê civaka zayendperest difikire ku aybek di wan de heye û kesekî qîma xwe bi wan ne aniye. Jin li ser fikra mêr û zewac pîroz in mezin dibe. Di vê zîhniyetê de cîh ji azadiyê re nîne. Zîhniyeta jin mulkê bav, bira û hevjînê xwe ye destûr nade ku jin azad bifikire. Mulkiyetkirina jinê tê wateya ew di fikir, ruh û fîzîk de girêdayî ye. Malbat, civak û hevjînê wê şûna wê difikirin, ji wê nayê xwestin ku bifikire. Ew xizmetkare; ya girîng baş xizmeta malbata xwe bike û zarokan bîne. Jina her tim bifikire çi xwarinê çêbike, çi li xwe bike û ji mala xwe re çi bikre ew nikare li ser azadiyê bifikire.

Jina hatiye perçiqandin û aşiqê koletiyê ye daxwaza azadiyê nake û wê her tim li pey mêr be. Jin gihandine asta di mejiyê wê de, ji derveyî mêr û zewacê tiştekî dîtir nebe. Ew ji mêr dixwaze ku mulkê wî be û berpirsyartiya wê rabike. Pişta xwe dide mêr û xwe teslîmî wî dike, jin bi xwe dibe sedema bikeve xefka mêr û zayendperestiyê de.

Azad fikrandin çi ye? Dibe ku gelek pênaseyên wê hebin; mînak çawa ji xwe re xeyalan çêbike, ne mîna efendî û ne jî weke koleyan bifikire, wê di pêşerojê de bibe çi, ne tenê li ser gotinên jêre hatine kirin bifikire, bîranîn û mirovên di jiyana wê re derbas bûne bibîr bîne, bi civak û kevneşopiyan re bikeve nava nakokiyan de, destbi lêgerînê bike. Azad fikrandin dibe ku tenê bi lêgerîna heqîqetê ve girêdayî be û were wateya pey heqîqetê bikeve. Dev ji malbat û hemû xeyalên xwe berde û li heqîqetê bigere.

Bi hezaran jin azad difikirîn û lêgervanên heqîqetê bûn. Hîs dikirin û difikirîn ku mêr û zayendperestî zulmê li wan dikin û ti maf ji wan re nehiştine. Jina dûrî iqtîdara malbat, dewletê û kevneşopiyan bikeve, ew dikare dest pê bike azad bifikire. Jina 24 saetan mêr di mejiyê wê de be, ew nikare azad bifikire. Ji xwe wê çarenûsa wê di destê mêr de be. Bav, bira û hevjîn wê bi rêve dibin. Kengî bixwazin îhanetê lê dikin û hebûna wê ne diyar e. Jina bê rûmet be û hebûna wê ne diyar be ew nikare azad bifikire. Di ruh de tê kuştin û tenê fîzîkî ma ye, tu nirxê wê nîne û kesek rêz nade wê.

# Nameya ku Rêber Apo ji bo Jineolojî şandiye bo me çi rave dike?...(2)

**Îsyan Karadeniz**

Gelek caran di çirok û mitolojiyan de em rastê berxwedaniyên gelan a li hemberê serdestan tên û her carê jî yan bi şekleki eşkere yan jî weşartî navê jinekî, komên jinên berxwedêr dibîhîsîn. Di çema dirokê ya civakên berxwedêr de her tim şopa jinan hene... gelo ev nîşanê ya çi ye? Girêdanbuyinekê jin û civakê yê çawa heye? Ev mijar mijarekê lêgerîn û lêkolinê ye.

Di hişê civakê de peyva jin her tim bi peyvên jiyan û azadiyê ve ji heman kokê tên û xwedî hevsengî ne. Ji ber vî yên ku bi daxwaza azadiyê radibin jî her wiha yên ku dixwazin civakekî, dirokekî ji holê rabikin bi hilweşandina cihên dirokî û baweriyê, bi talan kirina berhemên civakê, êriş birina ser jinê ve destpê dikin. Jinê wekê xanimet bi xwe re dibin, difiroşin, dikin cariye an jî dikujin. Heger em diroka êrişên ku li ser xaka me çêbuyê binêrin dikarin vê rastiyê bîbînîn.

Asta azadiya jinê asta azadiya civakê dide diyar kirin. Civakekî ku tê da mafê jinê, etik û estetika jinê ninbe em nikarin behsa mafê jiyanê bikin, nikarin keliyek behnekî azad bîstînîn. Rêber Apo di nameya xwe de bal dikşine ser vê mijarê û dibejê; ''Budha gotiye; "Heta ku tu xençera di pişta civakê de dernexînî, tu nikarî qet tiştekî bikî". Belê, gelek pirsgirêkên civakê hene, lê xencera di piştê de koletiya jinê ye û heta ku tu vê xencerê dernexînî, tu nikarî ti pirsgirêkan çareser bikî.''

Em nasnameya jinê, jinbuyinê çawa digrin dest û çawa bi nav dikin?

Êş û zahmetiyên her jinekî çiqasî parve dikin an jî ev xençera li pişta xwe çiqasî hîs dikin?

Di derbarê hiskirin û femkirina jinê de Rêber Apo dibejê; ''Ez dizanim jinbûn çiqas zehmet e û bi vê zanebûnê viya dibêjim. Dema di bin çanda tecawîzê ya zilam de jiyan dike, bi awayekî azad xwe avakirin, ji bo jinê zehmet e. Lê jin vê rastiya şewitîner qasî min bi êşkişandinê, bi hêrsbûnê hîs dikin yan na, ez nizanim. Ez bi vê hêrsbûnê her roj bi awayekî fikrî xwe nû dikim, çareseriyê hildiberînim û ji bo ku jin bi awayekî azad bijî, dijîm. Wateya jiyanê li cem min bi vî rengî rasteqîniyê qezenç dike. ''

Her wiha dema ku mijar dibe pirsgirêka azadiya jinê ji aliyê mêran ve wekê ku ev pirsgirêk aîdê jinê ye û ev bi xwe pirsgirêke tê meyzandin. Di vê warê de jî Rêber Apo rêgeza sosyalizmê tîne bîra me û dibejê; ''Pîvana mêrekî ya sosyalîstbûnê jî ew e ku zanibe li gel jinê bi awayekî rast bijî. Ev rêgeza bingehîn a Sosyalîzmê ye. Di tecrubeyên sosyalîst ên di tevahiya dîrokê hatine jiyankirin de ev rêgez her tim kêm maye. Ji Marks heta Stalîn, ji Mao heta Lenîn, eger pêwendiya tevahiya rêberên pêşeng a bi jinan re were lêkolînkirin, wê ev heqîqet hîn baştir were fêmkirin.''

Jin xwedî nasnameyekî civakiye ku ne pirsgirêka azadiya jinê ne jî êrişên li ser jinê şexsî were nirxandin. Lê belê derveyê Rêber Apo tu rêber an jî tu kes vêya wekê pirsgirêkekî sereke an jî wekê pirsgirêkekî tevahî negirtiye dest û nenirxandiye. Di her taciz, tecavuz, kuştin û her wiha nirxandinên zayendperest ku zilamtiyê bilind dike de hewcedarî heye ku em xençera li pişta xwe hisbikin û êdi ji bo rakirina vê xençerê xwe berpirsiyar bibinin.



# 'Pêşangeha Şehîd Herekol bûye sembola zanînê'

Di nav rewşa zehmet a ku Sûriyê tê re derbas dibe, pêşangeha Şehîd Herekol a Pirtûkan a Navnetewî wekî derfetekê li pêşiya derbirîna nivîskar, rewşenbîr û xwîneran tê lidarxistin. Endamên Komîteya Amadekar Narîman Evdikê û nivîskar Faris Osman anîn ziman ku li gorî pêşangehên bûrî asta pirtûkên beşdar baştir e, lê rewşa ewlehî hişt ku pêşangeh gavan bi paş de biavêje. Herwiha tekez kirin ku pêşangeh bûye sembola zanînê di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Bi dirûşmeya "Pirtûk Kilîda Şaristaniyê ye" Pêşangeha Şehîd Herekol a navdewletî ya pirtûkan di 21'ê Cotmehê de hat destpêkirin û heya 26'ê heman mehê wê bidome. Pêşangeha Herekol a navdewletî ya pirtûkan li Bexçeyê Azadî tê lidarxistin.

Ev pêşangeh ji hêla Desteya Çandê ya Kantona Cizîrê û Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûryê ve, herwiha bi hevkariya Kompanya Şemal, Four Seaons, Kampaniya Newroz, Venus Star, Şaredariya Gel a Qamişlo, Kompanya Rcell û sê Kompanyên din tê lidarxistin. 51 weşanxane ji tevahiya Kurdistanê û li ser asta cîhanê, 140 hezar pirtûk bi 14 hezar serenavî di Pêşangeha Şehîd Herekol de tên dîtin, 40 ji sedî pirtûkên li ser jinê ne, 43 ji sedî pirtûk bi zimanê Kurdî, pirtûkên ji bo darokan 4 ji sedî ne.

li Bakur û Rojhilatê Sûriyê herwiha li ser asta navnetewî pêşangehê vedenga xwe daye û bûye xwedî cihekî taybet di nav rewşenbîr, nivîskar û wêjevanan de.

Derbarê lidarxistina 9'emîn Pêşangeha Şehîd Herekol a Pirtûkan a Navnetewî endama Komîteya Amadekar a pêşangehê Narîman Evdikê û nivîskar Faris Osman ji rojnameya me re axivîn.

**'Asta berheman baş e, lê ewlehiya Sûriyê pêşangehê lawaz dike'**

Narîman Evdikê anî ziman ku asta pirtûkên beşdar baştir e li gorî pêşangehên bûrî, lê rewşa ewlehî hişt ku pêşangeh gavan bi paş de vegere û wiha bi lêv kir: "Ji bo pêşxistina asta çand û wêjeyê, herwiha dayîna derfetan ji bo nivîskar û rewşenbîran pêşangeh tê lidarxistin. Diviyabû îsal 60 weşanxane tevlî pêşangehê bibin, lê ji ber rewşa ku li Sûriyê tê re derbas dibe, bû sedem ku ew xwe vekişînin. Weşanxaneyên ku xwe vekişandin piraniya wan ji welatê Erebî bûn, ew ji ber mijarên ewlehiyê û tirsa ji girtina sînoran li pêşiya wan vekişiyan. Di heman demê de jî hin weşanxane weke yên Bakur û Başûrê Kurdistanê, Lubnan û hin welatên din ên beşdar bûne, pirtûk şandin, lê bi fîzîkî hazir nebû, wan wekîlên xwe erkdar kirin ji bo ku weşanxaneyê bi rê ve bibin. Bi giştî asta berheman baş e, lê hin sedem hiştin ku gav ber bi paş de werin avêtin di warê pêşangehê de, ew jî ne girêdayî Komîteya Amadekar an jî kompanyên bisponser in, lê belê rewşa ewlehî asta pêşangehê lawaz kiriye."

**'Armanc ew e ku em pêşangehê bigihînin asta cîhanî'**

Endama Komîteya Amadekar a Pêşangeha Şehîd Herekol Narîman Evdikê da zanîn ku armanca wan ew e ku pêşangeh bigihêje asta cîhanî û wiha got: "Dema ku weşanxane û mêvan ji gelek welatan tevlî pêşangehê bibin û şertûmercên navnetewî di Pêşangeha Şehîd Herekûl de hebin, êdî sîfeta navnetewbûnê lê tê kirin. Navlêkirina 9'emîn Pêşangeha Şehîd Herekol a Navnetewî xwedî armancek bû, ew jî ku em pêşangehê bikin cîhanê û ew jî bibe mîna pêşengehên navnetewî yên cîhanî. Me di vê çarçoveyê de gavek avêt, hêviya me ew e ku di siberojê de em gavên baştir û mezintir bavêjin, da ku ev pêşangeh bi fermî bikeve nav refên pêşangehên cîhanî."



Narîman Evdikê



Faris Osman

**'Pêşangeha Şehîd Herekol bûye semboleke zanînê di herêmê de'**

Osman tekez kir ku pêşangeh bûye sembola zanînê di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û wiha got: "Pêşangeh bûye boneyeke salane ku nivîskar û xwendevan her sal tên li hev dicivin, pirtûkan dibînin, dibin û dixwînin. Tişta balkêş û girîng di pêşagehê de ew e ku Pêşangeha Şehîd Herekol xwîneran ber bi xwe ve dikişîne bi taybet xwînerên ciwan. Pêşangeha me navdar bûye, ew di destpêka temenê xwe de ye, ew hin bi hin ber bi asteke cîhanî ve diçe, lewma wê gav bi zehmetî bên avêtin. Li hêleke din em dibînin ku ne tenê weşanxaneyên Kurdî beşdar bûne, lê belê weşanxane bi zimanê hemû pêkhateyên ku li vir dijîn beşdar bûne, ji ber wê jî ew di herêmê de bûye sembola zanînê di herêmê de."

**'Rola pêşangehê di pêşxistin û parastina zimanê Kurdî de heye'**

Osman destnîşan kir ku Pêşangeha Şehîd Herekol zimanê Kurdî li pêş dixe û diparêze û wiha domand: "Weke tê zanîn rêjeya pirtûkên bi zimanê Kurdî îsal 43 ji sedî ye, ev yek jî ne hindik e û cihê şanaziyê ye. Di destpêkê de piraniya nivîskarên Kurd nikarîbûn bi zimanê xwe bixwînin û binivîsînin, lê îro piraniya nivîskarên Kurd li Rojava bi zimanê Kurdî berheman derdixin û asta wan berheman jî her ku diçe bilindtir dibe, hem jî hejmara pirtûkan zêdetir dibe. Li aliyekî din dibistan, zanîngeh û pêşangehê me bi zimanê Kurdî çêbûne ev yek jî cihê dilxweşiyeke mezin e. Weke tê zanîn ku Rojava bi helbestê û helbestvanan navdar e, lê em dibînin ku êdî roman, çîrok û nivîsa pexşanî jî bi riya beşdarbûna nivîskaran di pêşangehê de diyar dibe. Rola Pêşangeha Şehîd Herekol di parastin û lipêşxistina zimanê Kurdî de li pêş e, divê em li ziman, çand xwedî derkevin ew jî bi riya pêşangehê û hemû çalakiyên din."


**'Çar berhemên min di pêşangehê de hene'**

Nivîskar Faris Osman diyar kir ku wî çar berhem tevlî pêşangehê kirine û axaftina wiha bi dawî kir: "Ji destpêka ku Pêşangeha Şehîd Herekol ve hatiye lidarxistin, ez tê de beşdar bûme, bê guman salane min pirtûkên xwe tevlî pêşangehê kirine. Îsal jî çar berhem di pêşangehê de hene. Pirtûkek li ser dîroka Newrozê bi zimanê Erebî ye, berhemeke din li ser Ûsivê Çelebî ye bi zimanê Kurdî hatiye nivîsandin. Herwiha berhemeke din bi du beşan li ser dîroka Kurdan di Sûriyê de û pirtûkeke din li ser Cegerxwîn bi zimanê Erebî hatiye nivîsandin, di Pêşangeha Şehîd Herekol de beşdar kirine. Zanîn û şaristanî tiştekî gelekî girîng e, pirtûk jî weke kilîta wê ye û bi rêya pirtûkan zanîn pêk tê. Lewma jî da ku zanîneke baş pêk were divê piştgiriya nivîskaran were kirin, nivîskar diwestin. Li Rojava dema ku nivîskar pirtûkan îmze dikin bi sedan pirtûkan diyarî xwîneran dikin, eger buhayê berheman di pêşangehê de bilind be jî ev tişt piştgiriyeke ji bo nivîskar, lê divê nirxekî madî yê li gorî aboriya civakê be."

# 'Armanca Koma Arî zindîkirina çanda gelê Kurd e'

**Hêvî Keleş/Qamişlo**

**Stranbêj û endama Koma Arî Latşîn Ibrahîm destnîşan kir ku wan bi armanca zindîkirina çanda gelê Kurd Koma Arî ava kirin û wiha got: "Me bi avakirina Koma Arî kevirê bingehîn ji bo projeyek çandî û hunerî danî, armanca sereke jî parastina çand û mîrateya Kurdî ye."**



Bi armanca vejandina mîrateya Kurdî û parastina stranên gelêrî yên kevin ên ku nasname û çanda gelê Kurd îfade dikin, Koma Arî ya muzîkê Komeke muzîkê di Tîrmeha 2025'an de li Helebê hate damezrandin,

Koma Arî stranên Kurdî yên gelerî yên cur bi cur ku dilsoziya wan a ji bo doz û nasnameya wan nîşan dide, pêşkêş dike.

Ev kom ji aliyê 13 xwendekaran ve li Navenda Yekîtiya Xwendekaran a li taxa Eşrefiyê ya Helebê hate avakirin.

Derbarê avakirina koma Arî stranbêj û endama komê Latşîn Ibrahîm ji Rojnameya me re axivî.

**'Em bi hunera xwe stranên xwe yê filiklorî zindî dihêlin'**

Latşîn Ibrahîm anî ziman ku armanca wan ji avakirina komê zindîkirina çanda Kurdî ye û wiha got: "Armanca me ya sereke ew e ku em mîrateya muzîka Kurdî ji windabûnê biparêzin û bi şêwazekî hunerî ya modern bêyî ku ruhê wê yê resen winda bibe, wê bigihînin nifşên nû. Em dixwazin strana Kurdî di nav gelên herêmê de vegerînin cihê wê. Ji dema avakirina koma Arî ve û heta niha me di 3 şevbuhêrkên li Helebê de stran ji girseya gel re pêşkêş kiriye, herwiha em beşdarî vekirina keleha Helebê jî bûn. Di koma me de 13 xwendekar hene ku 6 ji jinên ciwanin û 7 xort in, ew ji bajarê Efrîn û Kobanê ne û li Helebê gihiştin hev û kom ava kirin. Ciwanên komê amûrên kevneşopî yên wekî tembûr û zirne li kêleka amûrên nûjen lêdixin, ew bi tevlihevkirina muzîka resen û ya nûjen muzîkek bêhempa diafirînin. Em piranî stranê filiklorî pêşkêş dikin, ji ber ku di vê demê de gelek stranên me yên filiklorî winda bûne. Em dixwazin bi riya hunera xwe stranên filiklorî zindî bikin û nehêlin ku winda bibin."

**'Her stranek ku em hildibijêrin çîrokek ji dîroka me ye'**

Latşîn Ibrahîm axaftina xwe wiha qedand: "Her stranek ku em hildibijêrin çîrokek ji dîroka me ye, ji kêfên gundan bigire heya êşên koçberî û têkoşînê, ji ber vê yekê em wê bi dilê xwe berî dengê xwe pêşkêş dikin. Bi vêavabûnê, koma Arî kevirê bingehîn ji bo projeyek çandî û hunerî danî ku armanc dike mîrateya Kurdî biparêze û wê di bîra nifşên pêşerojê de zindî bike, da ku muzîk di çiya û geliyên Kurdan de zimanekî nemir bimîne."

# ‘Dorpêçkirina Şêxmeqsûd û Eşrefiyê wê kirîzên aborî û mirovî bi xwe re bîne’

**Cîgira Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Dunya Bekir diyar kir ku gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê heya roja îro di nava dorpêçeke giran de ne û got, “Ji aliyê çekdarên hikumeta veguhêz ve gel rastî gelek kiryarên çewt tên û bi awayekî rehet nikarin tevbigerin, ev yek jî wê bibe sedema kirîzên aborî û mirovî."**

Birûc Resûl/Qamişlo

1’ê Nîsana îsal di navbera Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û nûnerên hikumeta veguhêz ên Helebê de peymanek têkildarî her du taxan hatibû îmzekirin. Di çarçoveya pêkanîna peymanê de, 7 bendên kontrolê yên hevbeş ên di navbera hêzên ewlehiya giştî û Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên her du taxan de li ser rêyên sereke hatin danîn. 7 rêyên sereke (Çerxerêya Leyremûn, Çerxerêya Cendul, Rêya Parkê, Çerxerêya Şîhan, Telet Eşrefiyê, Ewarid, Cizîrê) taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û taxên din ên Helebê bi hev ve girê didin. Lê hêzên hikumeta veguhêz peyman binpê kiriye; dron li ser her du taxan gerandin, sivîl li ser rêyan hatin revandin û cihên giştî wekî Nexweşxaneya veguherandin xalên leşkerî.

Di çarçoveya rewşa dawî ya li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de, Cîgira Meclisa Giştî ya Taxên Şêx Meqsud û Eşrefiyê Dunya Bekir ji Rojnameya me re axivî.

**‘Gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi rihê şerê gelê şoreşgerî daketin qadan’**



Duniya Bekir di dstpêka axaftina xwe de bal kişand ser peymana 1`ê Nîsanê û wiha anî ziman: “Di peyama 1`ê Nîsanê ya ku di navbera Meclisa taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û parêzgeha Helebê ya girêdayî hikumeta veguhêz de hat çêkirin, herwiha li ser hin xalan hat îmzekirin, yek ji wan xalên ku li ser hat israr kirin nîqaşkirin ku ew satirên axî li derdora taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê werin rakirin, da ku gel bi rehet û azad tevbigere, bêguman ev yek hat qebûlkirin û îmzekirin. Lê piştre me dît ku di navbera her çed rojan de bin pêkirinek di hat çêkirin, di heman demê de ku careke din ew satirên axî li derdora Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatin danîn, êdî her dû tax ketin di nava dorpêçekî hişk de, ji bilî vê yekê jî çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirk û çekdarên wezareta parastinê yê hikumeta veguhêz, derdora satrên axî çekên giran danîn. Lê xwepêşandanekî pir bi wate û bi rihê şerê gelê şoreşgerî gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê herikîn qadan, di heman demê de ku nerazêbûne û helwestên xwe li dijî van kiryaran nîşan dan.”

**‘Dorpêça li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê wê qirîzekî mezin bide avakirin’**

Duniya di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Daxwaza gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ew bû ku ew satirên axî werin rakirin, ji ber ku ev dibe dorpêçek li hemberî jiyana gel, lê ev yek bû sedem ku şerekî leşkerî were destpêkirin, ev şer jî rojek dirêj nekir, li vir hem şehîd û birîndar jî hatin dayin. Bêguman ji bo çareserkirina vê piesgirêkê, di heman demê de ku şer di navbera Ewlekariya Hundirîn û çekdarên hikumeta Şamê were rawistandin, bi çûyine şandeyeke ji Rêveberiya Xweser û QSD`ê lihevkirinek çêbû û agirbest hat îlan kirin. lê heya roja îro ev dorpêç dewam dike, ji 7 rêyan tenê 3 rê vekirine û ew rê jî ne bi awayekî ewle ye, her kes nikare bi rehetî biçe û were. Ev yek jiyana gel dikeve di nava xeteriyekî cidî de. Di heman demê de ku kirîzeke aborî bi xwe derxe.”

**‘Gel rastî gelek nêzîkatî û kiryarên çewt tên’**

Cîgira Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsud û Eşrefiyê Dunya Bekir di dawiya axaftina xwe de behsa kiryarên ku niha çekdarên hikumeta veguhêz li hemberî gel didin meşandin û wiha pê de çû: “Ji bilî ku niha her du tax di nav dorpêçeke hişik de ne, gel rastî gelek nêzîkatî û kiryarên çewt tên. Gel bi awayekî rehet nikare tevbigere, lê dîsa jî çekdarên girêdayê hikumeta veguhêz ne, kiryarên li dijî gel dijî gel didin meşandin, mîna kontrolkirina telefonên jinan û xoratan, kontrolkirina çenteyên jinan û zarokan, di heman em ê de destdirêjî ango girtin. Mirov dikare bêje ne aramiyek û ne jî rehetiyek gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê heye, di heman wextî de heta tu kes nikare biçe nexweşxaneyan, rastî gelek zehmetî û astengiyan tên. Rastî em dixwazin ev peymana ku hatiye îmze kirin bi awayekî saxlem bikeve piratîkê. Em bi hêvî ne ku xalên di peymana 1`ê Nîsanê de hatin îmzakirin bi awayekî lez bikeve piratîkê. Ji ber ku eger ewşa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê wiha bimîne, wê qirîzekî aborî û mirovî çêbibe.”

# Welatparêzê Kurd Rêzan Meirûf

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Rojavayê Kurdistanê xaka welatparêz û berxwedêran e, yek ji welatparêzên vê xakê ku wealtparêzî ji bavê xwe girtiyê û tevî hemû zehmetiyan bi xak, çand û nasnameya xwe ve girêdayî maye, Rêzan Meirûf e.**

**Kurtejiyana welatparêz Rêzan Meirûf**

Welat parêzê Kurd Rêzan Meirûf di sala 1967’an de li gundê Zixatê ji dayîk bûye, zarokatiya xwe li gund qedandiya û heya roja îro jî dev ji cih û warê xwe bernedaye, ew hîn jî jiyana xwe di gundê xwe de berdewam dike. Zarokatiya xwe bi feqîrî derbas kiriye, hîn temenê wî 5 salî bû ew çû dibistanê û pêşdibistan bû, ji ber ku feqîrî hebû û ew derfetên baş ji bo gundan nebû, dibistana wan odeyeke piçûk bû ji ber kursî têra xwendekaran nedikir wî tenekeyek bi xwe re dibir da ku li ser rûnê, wiha xwendina xwe ya seretayî qedand. Dema temenê wê 12 salî bû girêdana wî bi netewa wî re çêbû, bandora karê bavê wî lê dikir. Di wê demê de êdî dixwest şoreş û dozên kurdan nas bike, her şev dema berê xwe dida odeya xwe da ku raze radiyo bi xwe re dibir û li radiyoya Dengê Kurdistanê û Yêrîvanê guhdarî dikir. Di sala 1979’an de berê xwe da bajarê Qamişlo da ku li dibistana Telai dest bi xwendina navîn bike. Lê mixabin ji ber ku bingeha wî di zimanê erebî de nebû û ew bi kurdîtiya xwe ve girêdayî bû di refa 7‘an de bibin ket.

Piştî wê hat bajarê Rimêlan û gelek astengî dîtin heya ku du sal ji xwendina navîn qedand û êdî berê xwe da bajarê Dêrikê, da ku refa 9’an bixwîne ji ber asta wî ya xwendinê kêm bû hevalê wî yê bi navê Mêvan Omer, ku ew jî ji gundê Zixatê bû pêre bû alîkar da ku vê refê biserkeftî derbas bike. Hêviya wî ew bû ku bibe pîlot lê ji ber ku ew kurd bû û navê wî jî yê kurdan bû nehat qebûlkirin. Lewma berê xwe da Rêveberî û reforma çandiniyê xwe li wir di dibistana amadehî ya teknîkî ya alavên Çandiniyê li Qamişlo tomar kir. Ew dibistan sîstema wê girtî bû ku him dibistan bû û him jî cihê xwarin û mayîna xwendekaran bû. Di heman demê de di sîstema wan de alîkariya zarokên cotkaran dikirin, ji ber ku bavê wî cotkar bû ew ji vê yekê mehrûm nema. Dema dibû havîn wî berê xwe dida gund da ku alîkariya malbata xwe bike di milê xwedîkirina sewalan û çandiniyê de. Di sala 1987’an de piştî ku bawernameya xwe bidest xist û amadekariyên xwe dikir da ku berê xwe bide peymangehê, lê bavê wî nexweş ket û ji ber rewşa bavê xwe nekarî tevlî peymangehê bibê.

**Ji zarokatiyê ve Tevgera Azadiyê bandor lê kir**

Di wan salan de êdî hezkirina wî ji Partiya Karkerên Kurdistanê re çêbû ji ber ku bavê wî jî welatparêz bû hertim partiyê serlêdana wan û malên gundiyan dikirin, êvaran rewşa siyasî dinirxandin ji wan re û behsa wêrekî û têkoşîna PKK’ê dikirin. Di sala 1989’an de navê wî hat da ku here leşkeriya Rêjîma Baas, du sal û nîvan leşkerî kir berî ku leşkeriya wî bidawî bibe bavê wî koça dawî kir. Ji ber ku ew kurê mezin bû barê malbatê ket ser milê wî, di wê demê de raste debara jiyanê li ser sewaldariyê û çandinyê bû. Lê buhayê genim gelekî daketî bû lewma rewşa wan a madî nebaş bû. Di sala 1991’an de ew û keça apê xwe bi hev re zewicîn, di sala 2000’î de



Rêzan du salan bi çandinî û avdaniya pembû ve mijûl bû. Ji ber ku bawernameya çandiniyê pêre hebû wî xwe tomar kir di kar û barên civakî de li Hesekê û paşê navê wî hat ku bibe alîkarê çandiniyê li statoya pirojeyên çandiniyê li bajarê Dêrikê di sala 2003’an de. Lê ji ber ku girêdana wî bi partiyê re hebû ev yek bandor li kesayeta wî kir û li ser fikir û ramanên Rêber Apo zarokên xwe fêr kirin û keça wî tevlî refên gêrîla bû. Heya roja îro pirtûkan dixwîne û xwe ji parêznameyên Rêber Apo dûr nexistiye. Di heman demê de piştî şoreşa Rojava wî jî dest bi kar û xebatê kir ji bo civakê û niha jî wek Cîgirê meclisa Beravê cihê xwe digre. Her wiha niha dest bi kar kiriye ku komînekî di gundê Zixatê de ava bike ji ber ku di dema berê de çiqasî hewildanên xwe dikirin gundiyan ev yek qebûl nedikir.

**Xwenasîn**



## Rojava ji bo cîhanê mînak e!

Rohat Bulut

Gel û civak divê bi tu awayî reşbîn û bê hêvî nebin. Ji bo hebûnê pêwîstî bi hêvî û parastina jiyanê heye. Belê hêzên ku ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî, aborî, siyasî û desthilatî jiyana gel û civakan vediguherînin dojehê jî hene. Dema em berê xwe didin Rojhilata Navîn, yek ji erdnîgariyên herî tevlihev ên dîroka cîhanê ye ku her tim bûye qada pevçûnên di navbera hêzên serdest de. Lêbelê, di seranserê dîrokê de, biryardariya gel jî ji bo parastina hebûna xwe û pêşxistina azadiya xwe li hember hêzên serdest û zordariyê qet kêm nebûye. Şoreşa Rojava, ku yek ji mînakên herî berbiçav ên vê berxwedanê ye ku îro ne tenê ji bo gelê kurd, lê ji bo hemû gelên herêmê xalek girîng a werçerxê ye di lêgerîna pergala demokratîk û aştiyê de temsîl dike.

Modela Xweseriya Demokratîk a ku li Rojava derket holê, paradîgmayek nû temsîl dike ku li ser bingeha demokrasiya beşdar, wekheviya zayendî, hesasiyeta ekolojîk û rêveberiya herêmî ye ku ji avahiyên dewletê yên klasîk derbas dibe. Ev model wekî alternatîfek derdikeve pêş ku mafê diyarkirina çarenûsa gel li dijî sîstemên navendî û zordar ên dewletên serdest diparêze.

Tevî êrîşên hêzên serdest, gel û civakên Rojava mekanîzmayên xwe yên ewlehiyê ava kirin, saziyên demokratîk ava kirin, azadiya jinan dan pêşiyê û girêdanên xuşk û biratiyê di navbera komên etnîkî û olî yên cuda de xurt kirin. Ev pêvajo ne tenê berxwedanek an parastinek leşkerî ye; ew di heman demê de têkoşînek ji bo avakirina jiyanek demokratîk e.

Şoreşa Rojava wekî mînakek berbiçav a demokrasî û aştiyê xizmet dike, îlhamê dide hemû gelên bindest û yên ku têkoşîna azadiyê didin. Ew şahidiyek zindî ye ku çawa gelên herêmê dikarin derfetên jiyanek azad û wekhev bi hev re biafirînin. Di hawirdorek ku hêzên serdest nakokiyên berjewendiyan li herêmê gur dikin de, ezmûna Rojava çirayek bihêz a hêviyê ye ji bo hevgirtin û xwesteka jiyanek hevpar di navbera gelan de. Bê guman, ev rê tijî dijwarî ye; zilm, êrîş û ambargo berdewam dikin. Lêbelê, ev pergala xweseriya demokratîk ku bi îradeya gel bi xwe hatiye damezrandin, ne tenê mînakek berxwedanê ya dîrokî ye, lê di heman demê de hêviyek nû ji bo pêşerojê ye. Ji bilî berxwedana li dijî pergalê, ew têkoşîna gel e ku şêweya xwe ya rêveberiya demokratîk biafirîne û bidomîne.

Şoreşa Rojava nîşan dide ku demokrasiya rastîn û aştiya bi rizgariya gel mimkun e. Yekîtî û hevgirtina gel li dijî berjewendiyên hêzên serdest dikare bingehên jiyanek nû di cîhana nûjen de ava bike. Ev tenê bi pejirandina nirxên îradeya kolektîf, azadî, wekhevî û edaletê mimkun e.

Di encamê de, ezmûna Rojava dê berdewam bike ku parêzvanê herî bihêz ê xweseriya demokratîk û mafê xwerêveberiya gel li çaraliyê cîhanê be. Ev têkoşîn ne tenê ji bo herêmê lê ji bo hemû gelan di lêgerîna wan a azadî û demokrasiyê de çavkaniyek mînakî ya îlhamê ye. Lewma jî pêwîste ne tenê gel û civakên rojavayê Kurdistan, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêwîst hemû gelên bindest û yên ku têkoşîna azadiyê didin bi her awayî xwedî li vê şoreşê û pergala alternatif a demokratî a civakî derbikevin.



# Girîngtirîn şoreşên cîhanê

**Serdemên desthilatên zordar û serdest yên ku mafê gelan çewisandine, gelek in. Li hember wan serdeman gelek serîrakirin, serhildan û şoreş rabûn. Ev şoreş herî zêde ji aliyê faktora cotkar û bindestan ve pêk hatine, da ku hemû çînên dewletê kêmek be jî; bi wekhevî û edaletê jiyan bikin.**

Zana Roj/Qamişlo

Di cîhanê de di sedemên cuda cuda bi hezaran şoreş, serhildan û raperîn hatin pêkanîn. Hin ji wan şoreşan li hember desthilatdariya dewletê, birçîbûn û xizantî, zordestiya iqtîdarê, înkarkirina gelan û pêkhateyan û hwd.. Ev şoreş hinek ji wan serketin û hinek jî bi sedemên cuda bi bin ketin. Helbet hemû şoreşên ku hatine rakirin, civak ber bi azadî, demokrasî û tunekirina desthilatdariyê ve neherikîn. Di vê raporê de me xwest girîngtirîn şoreşên ku di cîhanê de hatine pêk anîn, bînin ziman.



**Şoreşa Îngilîz 1642-1651**

Şoreşa Îngilîz (1642–1651) yek ji girîngtirîn şoreşên dîroka Ewropayê bû ji ber ku wê sîstema hikumetê li Îngilîstanê guherand û rê li ber demokrasiya nûjen vekir.

Kirîz dema ku Qiral Charles yek hewl da ku bêyî erêkirina parlamentoyê serweriya mutleq û bacê ferz bike, dest pê kir. Ev yek hem parlamenter û hem jî gel hêrs kir. Her ku nakokiyên li ser desthilatdarî û olê zêde dibûn. Ev bû sedem ku di sala 1642’an de di navbera alîgirên qiral, ku wekî “Padîşah” dihatin nasîn, û parlamenterên bi serokatiya Oliver Cromwell de şerê navxweyî dest pê kir.

Şer bi salan berdewam kirin û bi serkeftina hêzên Parlamenter bi dawî bûn. Qiral Charles yek di sala 1649’an de bi sûcê xiyanetê hate îdamkirin. Ev bûyerek şok bû ku rêça dîroka Ewropayê guherand. Piştre Komara Îngilîzî di bin serokatiya Cromwell de hate ragihandin. Bi vê yekî re Îngilîstan bû welatê yekem yê bê padîşah.

Lê belê, desthilatdariya komarî zêde dewam nekir. Piştî mirina Cromwell. Di sala 1660’an de monarşî bi sînorkirina desthilatên padîşah hate sererastkirin. Vê yekê rê li ber monarşiyeke destûrî vekir ku desthilatdariya padîşah û parlamentoyê hevseng kir.

Bi vî awayî, Şoreşa Îngilîzî xalek werçerxê ya girîng ber bi demokrasiyê û azadiya gel ve temsîl kir ku di çarenûsa hikumeta xwe de xwedî biryarbûn.

**Şoreşa Firansayê 1789-1799**

Şoreşa Fransî ya 1789’an yek ji bûyerên herî girîng ên dîroka Ewropa û cîhanê ye ku xalek werçerxê ya mezin temsîl dike ku dawî li monarşiya mutleq li Fransayê anî û prensîbên azadî, wekhevî û biratiyê ava kir.

**Civaka Fransî berî şoreşê di sê çînan de hatibûn dabeşkirin**

1. Tebeqeya Yekem Rûhanî: Yên ku dewlemendiyeke mezin hebûn û ji bacan azad bûn.
2. Tebeqeya Duyem Esilzade (nubalae): Yên ku li qesran dijiyan û ji îmtiyazên taybet sûd werdigirtin, ew jî bêyî ku bacê bidin.
3. Tebeqeya Sêyem Gelê asayî: Ku gundî, karker, bazirgan û rewşenbîr di nav de bûn, hemû bacan didan û tevî xizaniya xwe jî hemû barê dewletê hildigirtin.

**Sedema Şoreşê**

Piraniya dîrokzanan hema bêje bi yekdengî avahiya monarşiya Fransî bi xwe wekî yek ji sedemên herî girîng ên şoreşê dibînin. Sedemên din bi giranî aborî ne ku birçîbûn û tunebûna xwarinê di nav feqîran de li Fransayê belav bû û buhayên kelûpelên bingehîn ên wekî nan û berheman zêde dibûn. Pirsgirêkek din a aborî îflasa dewletê bû ji ber lêçûna bilind a şerên berê, nemaze piştî beşdarbûna wê di şerê Serxwebûna Amerîkî de, bû sedema zêdebûna deynê giştî ku di navbera hezar û 2 hezar milyonî de bû. Herwiha gelek sedemên din yên aborî û serweriya dewletan li ser Firanseyê ji ber bê hêzbûn û rûxandina aborî. Lawaziya monarşiyê û têkçûna Qral Louis şazdemîn di reformê de.

**Encamên şoreşê**

Dema ku şoreşa firansayê bidawî bûye bi xwe re gelek guhartinên bingehîn di civak û pergalê de ava kir ji wan guhartinan ev in:

-Hilweşandina monarşî û pergalên feodal û dawî li îmtiyazên esilzadeyan anîn.

-Erêkirina mafên mirovan û sivîlan û xurtkirina prensîbên azadî û wekheviyê.

-Îslahkirina pergala siyasî û damezrandina destûrek ku desthilatan ji hev vediqetîne.

-Başkirina şert û mercên cotkaran, dayîna azadiya ked û xwedîtiyê ji wan re.

-Belavbûna ramanên şoreşgerî li seranserê cîhanê ku bû sedema îlhama gelên din da ku li dijî neheqî û zordariyê rabin.

Şoreşa Fransî ne tenê serhildanek navxweyî bû; ew jidayikbûna serdemeke nû ya azadî, edalet û hemwelatîbûnê bû. Bi dirûşmeya xwe ya sembolîk (Azadî, Wekhevî, Biratî) dengê xwe li cîhanê bilind kir.

**Şoreşa Haîtî 1791-1804**

Di dawiya sedsala 18’an de, yek ji mezintirîn şoreşên dîroka mirovahiyê li girava Saint-Domingue ya Karayîbê ku niha wekî Haîtî tê zanîn, teqiya. Di wê demê de, girav mêtîngera herî dewlemend a Fransayê bû, lê ew li ser xwêdan û xwîna bi sed hezaran koleyên Afrîkî yên ku li zeviyên şekir û qehweyê zilm û xapandin kişandin, hatibû avakirin.

Bi bandora ji ramanên nû yên ji Şoreşa Fransî derketine holê, wek “azadî û wekhevî”, koleyan di sala 1791’an de, bi pêşengiya Toussaint Louverture yê efsanewî, serhildan kirin û daxwaza azadî û bidawîanîna koletiyê kirin. Şerên xwînî bi salan li dijî hêzên Fransî, Spanyayî û Brîtanî berdewam kirin, girav di wê demê de veguherandin qada têkoşînê ji bo rûmet û azadiyê. Tevî girtina fermandar Louverture û sirgûnkirina wî bo Fransayê, hevalên wî di bin serokatiya Jean-Jacques Dessalines de têkoşîn berdewam kirin. Di sala 1804’an de serxwebûna welêt wekî Komara Haîtîyê îlan kir, û ew kir yekem neteweya reşik a azad li cîhanê û yekem welatê ku tê de bi temamî koledarî tê rakirin.

Şoreşa Haîtîyê di dîroka cîhanê de xaleke girîng nîşan da, bingehên mêtîngeriya Ewropî hejand û gelên bindest ên li Afrîqiya û Amerîkaya Latîn îlham kir ku ji bo rizgarî û edaletê têbikoşin. Bi vê şoreşê re, Meksîka ji nû ve ji dayik bû, di têkoşîna azadî û wekheviyê de bû mînak û di rêya guhertinê de îlham da gelên din ên li Amerîkaya Latîn.

**Şoreşa Maksîk 1910-1920**

Di sala 1910’an de, piştî zêdetirî sê dehsalan desthilatdariya dîktatorî ya Serok Porfirio Díaz, serokê ku bi destê hesinî welat bi rê ve dibir, hêrsa gel li Meksîkayê derket holê. Ev dîktator gel birçî û di nava xizaniyê de hişt. Di heman demê de dewlemendî di destên çend dewlemend û biyaniyan de hiştibû.

Francisco Madero rêberiya serhildanê kir û bang li gel kir ku li dijî neheqiyê serî hilde. Di demek kurt de rêberên populer li başûr û bakur tevlî wî bûn û daxwaza reforma çandiniyê û mafên cotkaran kirin.

Di deh salên şer de, Meksîka şahidiya şerên xwînî û giran kir, lê ew bi hilweşandina rejîma kevin û pejirandina Destûra Bingehîn a 1917’an bi dawî bû ku mafên karker û cotkaran da û prensîbên edaleta civakî saz kir.

**Şoreşa Bolşevîk an Şoreşa Cotmehê- 25’ê Cotmehê 1917**

Şoreşa Cotmehê (Octobr) Şoreşa Bolşevîk e ku di 25’ê Cotmeha 1917’an de li Rûsyayê pêk hat û beşek ji Şoreşa Mezin a Rûsyayê bû. Ew ji aliyê Partiya Bolşevîk ve di bin serokatiya Vladimir Lenîn de hate birêvebirin û bû sedema hilweşandina Hikûmeta Demkî ya Rûsyayê ku piştî hilweşîna Qeyseriyê di Sibata 1917’an de hatibû ser serweriyê.

**Sedemên ku hêştiye ev şoreş pêk were:**

1- Sedemên Siyasî: Lawaziya Hikûmeta Demkî: Piştî hilweşîna Qeyser di Sibata 1917’an de, Hikûmeta Demkî nekarî daxwazên gel bicîh bîne an jî ji Şerê Cîhanê yê Yekem vekişe.

Windakirina baweriyê bi sîstema kevin: nerazîbûneke berfireh li dijî desthilatdariya Qeser

Bilindbûna Partiya Bolşevîk: Ramanên Lenîn ên “aştî, erd û nan” belav bûn û karker û cotkar kişandin ber xwe.

2- Sedemên Aborî :Hilweşîna aboriya Rûsyayê: Şerê Cîhanê yê Yekem çavkanî kêm kirin û bû sedema enflasyon û kêmbûna xwarinê.

Birçîbûn û kêmbûna kelûpelên bingehîn: Qutbûna dabînkirinê û bilindbûna bihayan jiyana rojane pir dijwar kiriye.

Xizaniya zêde: Piraniya gel ji cotkarên feqîr bûn ku mafê wan a bidestxistina erd nebû.

3- Sedemên Civakî: Zehmetiyên cotkaran: Berdewamiya sîstemeke nîvfeodal ku erd di destên kesên jor de kom bibû.

Nerazîbûna karkeran: Şert û mercên xebatê yên nebaş, demjimêrên xebatê yên dirêj, û nebûna mafan.

Zêdebûna bandora sovyetan: Meclisên gel ên ku nûnertiya karker, leşker û cotkaran dikirin ji hikumetê bihêztir bûn.

4-Sedemên Leşkerî: Windahiyên giran ên Şerê Cîhanê yê Yekem: Bi mîlyonan kuştî, birîndar û hilweşîna moralê artêşê.

Serhildana leşkeran: Gelek leşkeran red kirin ku şer bikin û tevlî şoreşê bûn.

Armaca şoreşê jî ev bû: Bidestxistina wekheviyê di navbera hemû çînên mirovan de di hemû aliyan de, jiholêrakirina kapîtalîzma feodal, û bidestxandina sosyalîzm û çalakiya sosyalîst a yekgirtî li ser bingeha bernameya Bolşevîk a ku Lenîn di sê xalan de formule kiriye: avakirina aştiyê, dayîna erd ji cotkaran re ku bersiva hêviyên tevahiya gel dide. Di dawiyê de sîstema Qeyserî hilweşiya û li şûna wê desthilatdariya komunîst bi rêveberiya Bolşeviyan dest pê kir.

**Şoreşa Kûba Tişê Gîvara 1956 (Che Guevara)**

Di nîvê sedsala bîstan de, li Kubayê çirûskek şoreşgerî pêket. Ev şoreş ji aliyê komek ciwanên ku baweriya wan bi azadî û edaleta civakî hebû, pêk hat. Di nav wan de yê herî navdar bijîşk û şervanê azadiyê yê Arjantînî Ernesto “Che” Guevara bû.

oreşa Kubayê di sala 1956’an de li dijî dîktator Fulgencio Batista dest pê kir. Ev dîktator sîstemeke otorîter a hişk li ser gel ferz kiribû ku hêşt gel rewşeke ji xizantiyê û bê adeletê jiyan bike, her wiha dewlemendî tenê di destê hindikan de hêştibû.

Fidel Castro û hevalê wî Che Guevara ji çiyayên Sierra Maestrayê pêşengiya tevgera rizgariyê kirin û şoreşgeran li dijî artêşa hikumetê şerên wêrek kirin.

**Di 1959’an de bi ser ket û hikumeta sosyalîst pêk hat**

Di 1’ê Çileya 1959’an de, şoreşgeran serkeftin bi dest xistin û ketin paytext Havana, bi vê yekê hilweşîna rejîma kevin û destpêkirina serdemeke nû ragihandin.

Şoreşê hikûmeteke sosyalîst ava kir ku armanc ew bû ku wekheviyê di navbera welatiyan de bi dest bixe û Kubayê ji kontrola biyanî, bi taybetî jî ji kontrola Amerîkayê, rizgar bike.

**Tşê Gêvara kî ye (Ernesto Guevara)**

Ernesto Guevara di sala 1928’an de li Arjantînê ji malbateke çîna navîn ji dayik bû. Wî li Zanîngeha Buenos Airesê tib xwend û ji temenê xwe yê biçûk ve bi alîkariya xizan û nexweşan re eleqedar bû. Di rêwîtiyên xwe yên dirêj ên li seranserê welatên Amerîkaya Latîn bi motorsîkleta xwe, Guevara xizanî û neheqiya civakî ya ku gel rû bi rû pê re ye dît. Li ser wê esasê pêwîstiya guhertin û şoreşê li dijî rêjîmên dîktator û derwkar pêk bîne, dît.

Che Guevara sembola şoreşê bû. Wî ne tenê Kuba rizgar kir, lê di heman demê de li Afrîka û Bolîvyayê jî têkoşîna xwe ji bo gelên bindest domand, heta ku di sala 1967’an de li wir şehîd bû. Wêneya wî bû sembolek cîhanî ya berxwedan û azadiyê. Her wiha Şoreşa Kubayê di têkoşîna li dijî neheqiyê de bû mînak.

Ev şoreşên ku me anîne ser ziman hin ji girîngtirîn şoreşên ku ji bo adelat, wekhevî û azadiyê bi taybet a faktura bindest û cotkaran bû. ji bilî van gelek şoreşên din yên navdar jî hatin lidarxistin weke Şoreşa Çînê 1927, Şoreşa Îranê a Komara Îslamî 1979, Şoreşên Bihara Ereban 2011’an a ku ji Tunisê dest pê kiriye heyanî Misir, Lîbiye, Yemen û Sûriye dom kiriye, pêk hatin. Lê ev Şoreş ji guhartina sîstema desthilatdar û misogeriya mafê bindestan re bi encam nebûn.

# Guhertina siyaseta Rûsyayê li Sûriyê... Veguhertina ji ber berjewendiyan

Bi dirêjahiya kirîza Sûriyê re Rûsya weke hêzeke sereke û bibandor bû di kûrkirina kirîzê de, herwiha ew piştgira rêjîma Baas bû hetanî ku têkçû. Ji destpêka aloziya Sûriyê heta roja îro, Rûsya dikarîbû siyaseta xwe di hundir û derveyî Sûriyê de li gorî berjewendiyên xwe, biguherîne.

**Navenda Nûçeyan**

### Qonaxa duyem, siyaseta Rûsya ji 2011 heta 2015'an:

Ji destpêka qeyrana Sûriyê di sala 2011'an de, Rûsya wek lîstikvaneke sereke di qada Sûriyê de derket holê û ji roleke sînordar di qonaxên destpêkê yên şer de veguherî hêzeke bi bandor di rêveçûna bûyeran de. Siyaseta Rûsyayê ya li Sûriyê ji alîyekî ve berdewamî û nermbûna stratejîk ji aliyekî din ve li gorî berjewendiyên herêmî û navneteweyî yên Moskowê pêk dihat. Di destpêka xwepêşandanên li Sûriyê û derbasbûna wan ber bi şerekî çekdarî, Rûsya helwesteke piştgirî ji bo rejîma Baas da destpêkirin. Mosko çend caran vîto bikar anî da ku biryarên di Meclisa Ewlehiyê de yên li dijî rêjîmê derdiketin, vala derxîne û rejîm hilneweşe. Di vê qonaxê de, Rûsya bal dikişand ser vê yekê pêşîgirtina li destwerdana leşkerî ya Rojavayî da ku sînariyoya li Lîbyayê neyê dubarekirin. Di heman demê de Rûsyayê piştgirîkirina çareseriya



siyasî bêyî guhertina rejîmê dida meşandin û hertim tirsa wê ji rêxistinkirina leşkerî ya komên çete yên operasiyonê hebû.

### Qonaxa sêyemîn

Di Îlona 2015'an de, Rûsya tevgera leşkerî ya rastî li Sûriyê dest pê kir û li gorî daxwaza hikumeta Şamê êdî tevgeriya. Ev tevger xala guhêrînê ya mezin di hevsengiya hêza Sûriyê de pêk anî, serweriya hikumeta Şamê û hêza wê li ser rûbera Sûriyê xurt, vegerand. Armancên Rûsyayê li Sûriyê piştgiriya hukimê Essed bû û parastina bargehên leşkerî yên Rûsyayê bû. Di heman demê de da ku Rûsya hêza xwe li ser asta cîhanê bide pêşandan. Rûsya balafirên şer, hemû hêza leşkerî û çekên pêşketî û nûjen li himberî gelên Sûriyê bikar anîn. Herwiha bû destê sereke di rêveçûna operasyonên leşkerî yên mezin, mîna derxistina hêzên muxalefeta Sûriyê ji derdora Şamê, di heman demê de dagirkirina Efrîn. Lê di vê qonaxê de heya ketina rêjîma Baas, Essed bû deyndara Rûsyayê, lewma rûbereke mezin ji ax, xêr û berhemên Sûriyê kete bin destê Rûsyayê de. Jê û bi şûn de jî êdî Rûsyayê nas kir rewşa rêjîmê û siyaseta wê ber bi xetimînê ve diçe, lewma hin bi hin asta piştgirtiya xwe ji rêjîmê re kêm kir hetanî ku rêjîm hilweşiya.

### Siyaseta Rûsya piştî rûxandina rêjma Baas

Bi ketina rêjîma Baas re serokê Rûsî Vladimir Putin got ku hilweşîna Baas ji bo Rûsyayê nabe binkeftinek, lê armancên Moskoyê li Sûriyê pêk hatin. Rûaiyayê da ku pelikeke xwe spî li cem Beşar Elessed bihêle, li gorî ragihandina fermî ya Rûsî mafê penaberiyê da Essed û malbata wî ku li Moskoyê bi cih bibe. Piştre Rûasyayê xwest têkilyan bi hikumeta veguhêz re ava bike. Wê xwest bingehên xwe yên leşkerî li Beravê û deverên din biparêze û hebûna xwe di herêmê de bidomîne. Yek ji pêşaniyên herî girîng ên Rûsyayê piştî rûxandina rêjîmê ew e ku ewlehî û berdewamiya baregehên xwe yên leşkerî li Sûriyê misoger bike, bi taybetî baregeha hewayî ya Hmeimim û mînaya deryayî ya Tartus. Danûstandinên ji bo sererastkirina peywendiyên bi desthilata nû re li ser bingeha riyeke nû bêyî destwerdana Rûsyayê ya rasterast di dosiyaya Sûriyê de.

Lewma jî danûstandinên yekem di navbera hikumeta nû ya Sûriyê û nûnerên Rûsî de hatin kirin, û wan ji Rûrsyayê daxwaz kir ku têkiliyên sererastkirina şaştiyên bûrî bên kirin û rêzgirtina îradeya gelê Sûrî bigrin. Helwesta fermî ya Rûsyayê ew bû ku divê siberoja Sûriyê ji aliyê gelê wê ve were destenîşankirin, herwiha hemû pêkhateyên Sûriyê mafê xwe bi dest bixin. Hikumeta veguhêz a Sûriyê gelek daxwaz ji Rûsyayê kir ku serokê berê yê Sûriyê Beşar Elessed radest bike da ku were dadgehkirin. Di 15'ê Cotmehê de serokê hikumeta veguhêz Ehmed Elşer çû Moskoyê da ku bi rengekî ji rengan lihevkirineke di nabera hikumeta veguhêz û Rûsyayê pêk were û xalên weke hebûna bargehên Rûsî li Beravê û Qamişlo, hem jî mijara dadgehkirina Beşar Elessed. Li gorî tevgera Rûsî ya li Sûriyê piştî têkçûna rêjîma berê tekez dike ku berjewendiyên wê mezintir in ji rêjîman û ya girîng jê re ne berjewendiya gelên Sûriyê ye, ew niha li Qamişlo û Beravê bargehên xwe bihêztir dike.

# Dewlet rast nêzî pêvajoyê nabe û li Rojava pey lîstokên nû ye

**Egîd Jiyan**

Pêvajoya (Aşîtî û Civaka Demokratîk)kû Rêber Apo di 27 sibata 2025'de dabû destpêkirin heya naha di milê dewletê tû gavên berbiçav nehatine avêtin. Hûkûmet hîn şerê qirêj dimeşîn e, di zimanê xwede hîn gûhertin çênekirî ye.

Dewlet Baxçelî her kû diçe gav paşta devêje, cara yekem bû kû Serokê MHP'ê Dewlet Baxçelî behsa mafê hevîyê kiribû û pêvajo ûsa bi re ketibû. Demek ser gotinên wî derbas nebû ye wek Serokkomarê Tirkî yê ev jî gefan ji Rojava dixwe û behsa ''QSD xwe fesihkirin ê dike yan jî we mudaxale pêk bê' dike. Rixmê kû Rêber Apo got '' ev banga min tênê ji bo PKK'ê ''. Hîn di gotinên xweda îsrar dikin. Dîsa were bîra we dema kû Rejîma Baas ya kû li Sûrî yê 57 sal ser sûrî hûkûm kiri bû bi alîkarîya hêzên navdetewî HTŞ dawî li vî rejîmê anî (27 mijdara sala 2024) û neye ji bîrkirin kû HTŞ li Idlibê bi alîkarîya dewleta Tirk hat amadekirin û colanî jî bi salan dewletên derve jî amade kirin. Ji bo meşandina kare hûkûmetê amade û perwerdê kirin taybet DYA û İngîlîtera jî di navda bû.

Ketina hûkûmeta Baas 'ê ve êrîşên li ser Bakûr û Rojhilatê Sûrî yê bi çeteyên(SMO) ser tirkîye ve destpê kir. Esas êrîşa 27 mijdarê amadekarîya şerê dijî ji bo Rojava bû ji ber vî dewleta Tirk bawer kir kû di nava wê tevlîyevîyê de bi hêsanî Rojava têk bibe, bawer nedikir kû QSD hemberê wî bisekine û berxwedanîyek ûsa raber bike, herî dawî mejbûr ma gavan paşta bavêje. Yan jî bi rastî demek pir bi tevlîyev bû û gelê sûrî bi gîştî di nava sarxoşîyekî da bû kes nizane ka çi heye? an jî ev çîye? Ka ev hûkûmetek ûsa çawa zû têk çû kes hêvî nekir kû rewşek ûsa derkeve holê, ji ber wî yekê çeteyên ser Tirkîye yê dixwast ev firsandê bi kar bînin. Mixabin pilana wan pêk nehat. Milek din HTŞ çawa sûrîyê dagirkir yekser Qetlîyam ser gelê elewî pêk hat bi deh hezaran kes hatin qetilkirin bi deste wan çeteyên kû qaşo ji xwe ra dibêjin me şoreş pêk anî, ev esas tola ji Beşar Esad rakirine zîhnîyet ewe elewî hemû baas'îne lê ne ûsa ye. Piştra bere xwe da siweydayê lê ew wek xwastin pêk nehat pêk bihata wî yekser berxwe bidana Bakûr û Rojhilatê Sûrîyê, esas plana wan herî dawî ser kurdan dixwastin qetliyam pêk bînîn mixabin wek xwastin ne bû. Ji ber wî Serok Apo got'' elewî, dûrzî û kurd yekîtîya xwe pêk bînin''. Ser vî esas ê hin gav hatin avêtin û hin holdan tekirin kû yekîtîyek pêk bê.

Mijara 10 adarê lehevkirina QSD'ê û hûkûmeta demkî pêk hat, şaş fêm kirin çebû taybet gelê elewî şaş fêmkir. Ji ber tam dema kû qetlîyam ser gelê elewî pêk hat ev lehevkirin hat kirin. Esas hewceye kû ev lehevkirin ji bo tevahîya sûrîye yê pêk bê, hûkûmeta demkî ev lehevkirin pir caran binpê kir. Ger di Bakûr û Rojhilatê Sûrîyê gavên bi şaş çêbana wê heya naha bi navê wî tiştek nedi ma. Rojhilata navîne kengî çi bibe rastî ne dîyare tişte dîyar kî baş şopand û gavên rast avêt ewe serkeve. Kes dikare garantîya kû HTŞ bimîn e bîde na kengî kare wî pê xlas bû û wê jî ji holê rakin. Mînak dewleta Tirk şaşîyek mazin dike, terse wî bi QSD' ra dikare xwe xort bike mixabin wî HTŞ hilbijart. HTŞ jî çiqas bikari be ser piyan bi mîne ev jî mijarek din e.

Heman demê dîsa êrîşa li ser taxên kurdan yê helebê bi alîkarîya dewleta tirk pêk hat. Kes nikare wî înkar bike ji ber tam wextek ûsa bû kû gûman serê mirovande çêdibe ji ber heyeta Rojava çû Şam ê û êrîş pêk hat. Çiqas HTŞ bêje ew çeteyên Tirkan e û eleqeya me pê nîne ev ne raste ji ber tû hûkûmetî çawa bê agahîyate êrîşek ûsa pêk tê ev tiştek derveye aqilana ye. Di demê pêşta wê rewşa Sûrîye yê û Rojava çawa be mirov nikare tam nirxandinek rast bikin ji ber me got gûhertin bi lez pêk tê ji ber vî kî gavên rast avêt ew ê serkeve.



# 'Name gihan saziyên navdewletî, lê bêbersiv mane'

Rêveberiya Însyatîfa Sûrî ya ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir da zanîn ku pêngava nameyan û radestkirina nameyên Rêber Apo ji bo eşîreyên Ereban encamên gelek baş anîn, herwiha nameyên ji bo azadiya Rêber Apo yên ku ji rêxistinên navdewletî re hatin şandin, hîna bêbersiv in.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Însiyatîfa Sûrî ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan di 20'ê Tebaxê de tevlî kampanya "Ez dixwazim bi Rêber Apo re hevdîtinê bikim, bû. Encamên vê kampanyê di 21'ê Îlûnê de hatin eşkerekirin. Herwiha di 14'ê Êlûnê nameya ku Rêber Apo ji bo eşrîeyên Ereban nivîsandibû, hat dayîn û paşê bi riya Însiyatîfa Sûrî ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan li zêdeyî 31 eşîreyan hat belavkirin. Derbarê heman mijara derbasbûyî û xebata dema pêş a insyatîfê rêveberiya wê Ferzende Munzir ji rojnameya me re axivî.

### Kampanya nameyan

Ferzende Munzir têkildarî kampaniya nameyan a ku ji bo hevdîtina bi Rêber Apo re hatibû destpêkirin û bidawîkirin wiha got: "Kampanya ji bo hevdîtina bi Rêber Apo re di 20'ê Tebaxê de hat destpêkirin. Me nameyên akademîsyen, parêzer, çalakvan, siyasetmedar, bijîşk, rewşenbîr û hwd... li ser asta herêmê û tevahiya Sûriyê kom kirin. Bi giştî vê pêngavê hemû rengên gel û pêkhateyên Sûriyê hembêz kir, bi rengekî rasterast nav hatin tomarkirin, encamên vê kampanyayê di roja Aştiya Cîhanî de hatin eşkerekirin. hejmara kesên



ku tevlî kampanyayê bûn 2 hezar û 541 kes bûn. Ev kampanî bi awayekî serkeftî derbas bû û xwedî encameke baş bû. Piştre me ev name ji Neteweyên Yekbûyî, Meclisa Ewropî, CPT û Meclisa Hiqûqî ya Neteweyên Yekbûyî re şandin, lê heta roja îro ev sazî bersiva nameyan nedane."

### Nameya Rêber Apo ji bo eşîreyên Ereban

Munzir derbarê radestkirina nameya Rêber Apo ji eşîreyên Ereban re wiha anî ser ziman: "Di nava kampanya komkirina nameyan de jî, Rêber Apo nameyek ji şêx û rûspiyên eşîreyên Ereban re şand. Me bi hevkariya Kongra Star, Meclisa Ol û Baweriyan û saziyên Rêveberiya Xweser komîteyek ava kir, ji bo radestîkirina vê nameyê. Herwiha name ji eşîreyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re hatin xwendin. Di gera me ya radestkirina nameyan de me nêzî 500 kesayet, rûspî û şêxên eşîreyan dît û name radestî wan dikir. Di her hevdîtinekê de mîr, şêx, rûspî û hwd... ên eşîreyan didîtin, hin caran hejmara kesên ku hazir dibûn nêzî 50 kesî bûn, carcarn jî me name radestî şêxê eşîreyê tenê dikir. Di hevdîtinan de jî dema ku me nameya Rêber Apo radestî wan dikir, wan kêfxweşiya xwe tanîn ser ziman û nîqaşên berfireh ji bo nameyê dihatin kirin. Herwiha tevlî naveroka nameyên bûn û name spas kirin. Wan name esas dîtin ji ber ku Rêber Apo di vê nameyê de doza wekhevî, azadî, yekîtiya gelan û piştgirtiya gel ji bo QSD'ê kiriye. Di encamê de şêx û rûspiyên eşîreyan daxwaz kirin ku di demê pêş de civînan derbarê ramanên Rêber Apo ji bo wan li dar bixin û pêşinyara wan ew bû li her bajarî eşîreyên Ereban spasiya nameya Rêber Apo bikin."

### Xebata dema pêş

Rêveberiya Însyatîfa Sûrî ya ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir derbarê xebata insyatîfê ya dema pêş, wiha bi lêv kir: "Sê navendên me yên insiyatîfê hene û bi dehan endamên me li ser asta Sûriyê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê hene, me civîna xwe li dar xist û li gorî wê me diriyê pêşinyaran li pêşiya plansaziya dema pêş vekir. Pêngava "Ji Rêber Apo re azadiya fîzîkî û pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî" ketiye sala xwe ya sêyem de û weke em dizanin ku niha pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk tê domandin, wê plansaziya me jî li gorî pêngav û pêvajoyê be. Li ser bingehê pilansaziya ku xalên wê hatin pêşinyarkirin jî, wê di serî de rewşa Rêber Apo were şopandin û li gorî vê mijarê wê daxuyanî jî werin dayîn. Di heman demê de em ê li gorî perensîp û nirxê pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk kar û xebatê bidin meşandin. Herwiha em ê di salvegera Komploya Navnetewî de li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê meşan li dar bixin. Li aliyekî din em ê kampanyeke haştagê li ser malperên medya dijîtalê ji bo azadiya Rêber Apo bidin destpêkirin. Hem jî em ê komcivînan derbarê mafê hêviyê ji bo Rêber Apo li tevahiya herêmê li dar bixin. Di roja rojbûna Rêbertî de jî wê li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê li 77 cihên cuda dar werin çandin. Li hêleke din wê hemû insyatîf û parêzer reşnivîseke siyasî û hiqûqî derbarê çareserkirina pirsgirêka Kurd saz bikin, hem jî wê nameyan ji saziyên hiqûqî yên cîhanî re bişînin. Em ê têkiliyê bi sazî û rêxsitinên navdewletî re bidin avakirin û pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi wan bidin naskirin."

## Li Sûriyê ji bo demokrasiyê dê rê vebe?



**Zekî Bedran**

Bi navbeynkariya DYA'yê, li Şamê di navbera hikûmeta vegûhêz, QSD'ê û Rêveberiya Xweser de çend rêze hevdîtin hatin pêkanîn. Ji raya giştî re hat ragihandin ku hevdîtin ji yên berê erênîtir bûn. Hikûmeta HTŞ'ê ji hevdîtinên ku dê li Parîsê werin lidarxistin vekişiyabû. Ev yek bi saya alozî û destwerdana hikûmeta Tirkiyê bû. DYA, Fransa û NY de, dê beşdarî hevdîtinan bibin û wekî navbeynkarên peymanê tevbigerin. Hikûmeta Tirkiyê bi tundî li dijî vê yekê derket û hikûmeta Şamê rawestand. Wan dixwest ku pirsgirêka Kurd negihîje aliyekî navnetewî û nebe mijara mîsoger kirin ê. Vê rewşê hevdîtinên di navbera hikumeta Şamê û Rêveberiya Xweser de jî rawestand. Wezîrê derve yê Şamê paşê du caran bi Îlham Ahmed re civiya. Wekî ku carna rayedarên hikûmeta Tirkiyê li Enqerê dibêjin, wî jî got, "Werin em pirsgirêkê di navbera xwe de çareser bikin." (Ji van hevdîtinan tiştek derneket.) Hikûmeta Tirkiyê nexwest ku aliyek 3'emîn beşdarî hevdîtinên wan yên di navbera Îmraliyê û PKK'ê re bibe. Ew bi tevahî li dijî vê yekê ne. Bi aliyên 3'emîn, çavdêran re, ne gengaz e ku peymanan înkar bikin, bi dilxwazî xwe paş we bikşînin, an jî paşve gav bavêjin. Tirkiye di vê mijarê de pir pispor e. Gelek caran bi PKK'ê re civiya, lê her weha agirbest xerab kir in, danûstandin rawestand û şer û êrîş bi dilxwazî domand in. Ew dixwazin wan derfet û desthiladariyê bi tevahî bikar bînin. Niha, ew endamên HTŞ'ê yên ku wan girtine li gel xwe perwerde bikin. Armanca wan ew e ku rê li ber statû û deskeftiyên kurdan li dest xwistine û di heman demê de jî li ber fermîbûna pirsgirêka Kurd de di çavên raya giştî ya navxweyî û navneteweyî de bigirin. Li kengê, rayedarên hikûmeta Şamê bi QSD û Rêveberiya Xweser re dicivin, hemû hestên Enqerê yên neyinî çalak dibin. An ew li hatina xwe ya Şamê demildest destwerdan dikin an jî mîna parêzgarên xwe rayedarên li wir bang Enqerê dikin. Tevî danûstandinên wan ên rojane, ew hîn jî ne rehet in. Ew bi tevahî baweriya xwe bi wan naynin; ew her tim di nav fikaran de ne, bi hêviya ku Kurdan re soz bidin ku ji bona hevkirinê wan. Ger desthilatdariya wan hebûya, ew ê ji DYA û Ewropayê re bigota ku silavê nedin Kurdan an jî ti peywendiyan ava nekin. Wan gelek îdîa kirin, bi berfirehî danûstandin kirin û bêwestan xebitîn, lê ew qet nekarîn wan razî bikin. Dema ku ew nekarin wan rawestînin, ew niha li ser HTŞ'ê zext ava dikin. Wan ew xistine bin serwerîyekî pir tûnd û bibandor. Her çend dewleta Tirk li Sûriyê rolek astengdar û navendî dilîze jî, ew di hundirê welêt de jî zextê li Îmraliyê dike, hewl dide ku ji wir piştgirî bistîne. QSD û Rêveberiya Xweser bi berdewamî gef li wan hatin xwarin. Wan hewl dane ku bi eşîr û êlên Ereban re pevçûnê derxînin holê û her cûre hewldanên êrîş û aloziyan pêkanîn. Lê ev kar ne ewqas hêsan e ku ew dixwazin. Ew hewl didin ku ji hewldanên Rêber Apo yên ji bo aştî û çareseriyê sûd werbigirin û Sûriyê jî têxin nav vê pêvajoyê. Ji ber ku Rêber Apo wekî ku ew dixwazin tevnagere, li Tirkiyê ji bo aştî û çareseriyê ti pêşveçûn tine ye. Hikûmeta li Enqerê tu gavên berbiçav neavêtiye. Ew hîn jî Rêber Apo dîl digirin.

Sedema ku em vê ji nû ve dinivîsin û ji we re tînin bîra xwe ev e ku em ji ev dorhêleya erênî ya ji Şamê derdikeve holê zêde bandor nebin. Hêzekê alozîyê derdixin heye. Her çend rayedarên Tirk carnan wekî manevrayek dîplomatîk zimanek nerm pêşkêş dikin jî, piştî wan daxuyaniyên jehrîn û gefên ji Wezareta Parastina Neteweyî ya Leşkerî tên. Çapemeniya Tirk tijî kesên hov û şerxwaz e ku bi dar di destên wan de ye, li ser ragihandina şerê taybet xuya dibin. Piraniya komên faşîst ên ku li ser xwînrijandinê şîrove dikin wekî "profesor", "pispor" û hwd. têne binavkirin. Heta ku nijadperestiyê gûr dikin ku artêşa Tirk hişyar dikin û pêşengiya wê dikin bi li dora xwe piştgrî peyda dikin, divê em hêviyên xwe li hikumeta Tirk girê nedin an jî zêde bawerî wan neyin in. Şilîtên wan bi erdekê din ve girêdayî ne; ew ne bi serê xwe ne! QSD û Rêveberiya Xweser bi berdewamî li pey pêkanîna peymana 10'ê Adarê bûn û ji bo hevdîtinan amade bûn. Ew qet ji danûstandinan dûr neketin. Lê, aliyê din her gav biryarên yekalî dida. Wan ji bilî xwe kesî di nav hewldanên Rêveberiyê Xweser û ji nû ve avakirina Sûriyekê de negirtin. Wan pergalek yekdest û yek navendî xeyal dikir. Koka pirsgirêkê hişmendî û nêrîna wan a desthiladariyê bû. Wan Sûriyekê demokratîk ne dixwest. Wan dixwest ku QSD û Rêveberiya Xweser jî tevlî wê hişmendiya wan ya tund bib in. Dewleta Tirkiyê jî di vî warî de piştgirî dida wan. DYA di derbarê Xezayê de ket di nava lêv û tevgerê de. Agirbest pêk hat. Ew dixwaze aramiya herêmê biparêze û balê bikişîne ser hêzên mîna Îranê. Rejîma Baasê li Sûriyê hilweşiya, lê hîn jî metirsî berdewam dike, û komkujiyên Elewî û Durzî bûne mijarekê girîng. Ji ber vê yekê, ew dixwaze serweriya xwe Sûriyê ava bike û wê di bin hêza xwe de bigir e. Ji ber vê yekê, ew israr dike ku bi QSD re hevdîtinan bike û peymanê bicîh bîne. Ev hewldan dê çiqas bi berdewam berdewam bikin an encam bidin nayê zanîn. Zehmet e ku mirov bi teqezî bibêje. Hîn rêyek dirêj heye ku bê şopandin ji bona bê zanîn. Wekî me got, peyamên erênî yên ku têne şandin û pejirandina ku QSD dê li herêmê bimîne û gel biparêze erênî ne. Lê, rêkeftineke bi encamp di holê de hîn tine ye. Danûstandin berdewam dikin. Ji ber vê yekê, xelet e ku em bêj in, "Baş e, rêkeftinek heye, çareser bûye." Divê raya giştî û hêzên peywendîdar hesastir û baldartir nêz bin û nekevin bin bandora hêzên cûda yên dijî aramî û yekitiya gelên Sûriyê!!!

## Banga Bahçelî ya 22'yê Cotmehê



**Farûk Sakik**

22'yê cotmeha 2024'an de li meclisa Tirkiyê tiştek qewimî ku tu kes li bendê nebû. Devlet Bahçelî di civîna koma partiya xwe, ya heftane de bangî Rêber Apo dikir, digot; "Tecrîda ser Ocalan rakin bila were meclisê û di civîna koma DEM Partî de bangî rêxistina xwe bike, bila rêxistin xwe fesix bike û ji mafê heviyê sûd wergire."

Bi van gotinan her kes şoq bû. Bulent Arinc digot; "Min bawerî nanî, ez çûm, min serçavê xwe şûşt."

Di ser vê bangê re salek derbas bû. Rêber Apo tiştê ku jê dihat xwestin, di bêjinga berjewendiyên Kurdan de derbas dikir û bersiv dida. Pêşdîtinên wî bi demê re dihatin fahmkirin, an jî îdraqkirin. Fesixkirina PKK'ê û merasima çek şewitandinê di destpêkê de di nav civakê de bi hestyarî hat pêşwazîkirin. Lê bi demê re hat dîtin ku efektên van biryaran di têkoşîna Kurdan de pêşî li çiqas astengiyan vekiriye.

Em vegerin gotinên Bahçelî yê 22'yê Cotmehê. Bahçelî baş dizanibû fizîkî Rêber Apo wê nikaribe were wê parlementoya ku bîhna nijadperestiyê jê tê. Lê banga ku wê bike, wê li parlementoyê deng bide. Dizanibû Rêber Apo bi mafê hêviyê wê derbasî Amedê nebe.

Lê ji bo Kurdan ji Rêberê xwe re dema azadî dixwazin, mafê hêviyê dixwazin, dibêjin bila şertên jiyana wî azad bin. Komareke demokratîk ku hûn bi sala ne li pêşiyê asteng in, ew dikare pêk bîne. Ji bo vê yekê jî bi awayekî azad xwe bigihîne hemû rêbaz û amûran da ku Komareke Demokratîk re xebat bimeşîne.

Bahçelî bi Rêbertiya wî bawerî aniye û di her axaftinê xwe de wek "lîderek" xîtap dike. Lê li pêşiya Bahçelî astengiyek-dîwarek heye. Tiştê ku tîne ziman çima di pratîkê de bi kar nayne? Dibe gelo rola wî tiştên maqûl û mantiqî di nav civakê de ji bo bide bawerkirin, dide nîqaşkirin? Ha, hin kes dibêjin lihevkirinek wan heye. Wisa texmîn dikin. Em ne di wê baweriyê de ne. Bahçelî bixwaze dikare bê axaftin di pratîkê de gav bavêje. Dikare Erdogan û ekîba wî îkna bike. Ew jî şirîkê vê hikumetê ye. Tişta herî giring Bahçelî, li ser navê dewletê, di vê pêvajoyê de hatî erkdarkirin. Em pirs nakin dewlet mezin e an jî Erdogan? Ev dewleta kûr, veşartî bi çi awayî pênase dikin bikin, ew in ku AKP heta îro li desthilatê hiştine. Dewleta kûr û Bahçelî kê demê bixwaze dikarê kevirên-tuxlayên xwe ji dîwarê koalisyonê bikişînin.

Bîhnek-agahiyên nebaş van rojan belav dibin. Nijadperestên wek Partiya ÎYÎ li her deverî êrişî pêvajoya nû dikin û kes jî wan nade seknandin. Ev dewlet çima pêşî li wan vekir. Ji bo di navber MHP û ÎYÎ de şerek heye. Ji aliyê Erdogan ve ev partî tê bikaranîn. Bala we kişandibe bi tenê êrişî DEM Partî dikin. Erdogan dixwaze her tim li desthilatê be, dema ku ji MHP'ê îşaretên talûke dît li alternatîfek-yedek digere. Ew jî partiya ÎYÎ ye. Ji bo vê yekê ji niha de alternatîfa MHP'ê tevdigerin. Ev partî, li gor daxwazên alîgirên MHP û nijadperestan siyaset dimeşînin.

Dema ku partiya ÎYÎ li meclisê siyasetek wiha dimeşîne, Hakan Fîdan QSD hincet nîşan dide û pêvajoya çareseriyê sabote dike. Lihevkirina Şam û Kurdan jî wî aciz dike. Dibêje, bila QSD ji heremê ereban vekişe. Lê tu çima ji herêmê Kurdan venakişî? QSD ew gelên herêmê, ji DAIŞ'ê rizgar kir. Îro jî bi zarokên ereban ên di nav QSD'ê de ne, herêmê ji zîhniyeta te û ya DAIŞ'ê diparêzin.